# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (256):

## Sezayên li ser El'emşat û El'hemzat ciyê pîrozî û vehesiyê ne, gergoşî û girtinin, "Seyf Bolad" erdekî bi kirê dide, dozkirina sezakirina hin din







Biryara ku Şalyariya Gencîneya Emrîkî li Roja Pêncşemê (17 Tebaxa 2023an. Z) bi ferzkirina sezayinan li ser Milîseyên "**Firqit El'sultan Silêman Şah, Firqit El'hemze**" û serkêşên wan "**Mihemed Hisên El'casêm/Ebû Emşe, Seyf Bolad/Ebû Bekir**" û birayê yê yekê "**Welîd Hisên El'casêm**" û weha jî li ser wekaleta "**El'sefîr Awto/Auto**" ya makînan (ya ku biryargeha wê ya serekîn li Istanbûlê - Turkiyê û xwediyê wê Ebû Emşe ye) standiye, ji ber sûcdariya wan bi karanîna binpêkirinine metirsdar li dijî mafên mirovan li Herêma Efrînê, dilên Kurdan û bergiriyên mafên mirovan li Sûriyê û bi taybetî yên ku binpêkirin û tewan gihîştinê hênik kir, û ew li ba wan ciyê pîrozbahî û rehetiyê ye, lê li ba herdu giropan û tevaya Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" û "Hikometa Sûrî ya Demkî" û "Hemahengiya Sûrî - Ixwanî" (ya ku li vê dawiyê şandek jê li Efrînê û herêmine din ji herêmên dagîrkeriya Turkiyê digerî, weke hewildan ji bo cîlawkirina rûyê

Turkiyê ya dagîrker û nandozên wê û ronkirina dozên Efrînê û xelkê wê, û dandina sozên derewîn ji bo başkirina rewşê, û bi hevrêziya Istîxbaratên Turkiyê) tevliheviyek mezin çêkir û lingên wan bi ber hev xistin.

Û li 28.7.2021an. Z jî Emrîka li ser "**Firqit Ehrar El'şerqiyê**" û serkêşê wê "**Ehmed Îhsan Feyad El'hayês/Hatêm Ebû Şeqra**" û li ser "**Ra'êd Casêm El'hayês/Ce'ifer Ebû Şeqra**" - serkêşekî wê sezayin ferz kirin, bi sedema binpêkirinên wan ji mafên sivîlan re û dijayetiya wan a rêbazkirî ji Kurdên Sûriyê re, bi ser de jî kiryarên revandinê, koçberkirinê, zepkirina malmewdanan û kuştinê.

Duh herdu firqeyan endam û malbat û peyên xwe, yên berjewendiyên wan ên hevbeş hene, û nûker û keya û yên bi rûçikên herêmê têne navdan (yên ku ji bilî xwe kesî naminînin û ji bingeh ve ji aliyê milîseyan û erêkirina Istîxbaratên Turkiyê hatine bi navkirin), û hin xelk û anînde jî bi zorê, li hev kom kirin û xurcilandin, komelgehên "hevgirtinê" li Navenda Efrînê û bajarok û gundên di bin desteseriya wan de li dar xistin, û tê de kopiyin ji heman daxuyana pêşinde hatibû amedekirin bi navin çêkirî hatin xwendin.

Herweha "Sertîp/El'emîd Hisên El'hemadê - şalyarê bergiriyê di Hikometa Demkî de" daxuyanek derxist, tê de berevaniya yên sezakirî dike, binpêkirinên ku kirine red dike, û ji Emrîka dixwaze ku ji biryara xwe vegere.

**Ev jî heyîn û bûyînin li ser rewşên serwerbûyî ne:**

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li 12.8.2023an. Z, "**Ednan El'xuweylêd/Ebû Welîd El'ize** - yê ji Bajarê Humsê" berpirsiyarê abortiya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" û ê li Gundê "Qurnê/Qornê" - Navça Bilbilê rûniştî, Hemwelatî "**Ebid El'hemîd Mihemed Menan** /63/sal, **Mihemed Îso Ibrahîm** /50/sal, **Hisên Mihemed Horo** /49/sal û şûngirê wî yê yasayî **Ebid Elah Ebid El'rehman Ibrahîm** /49/sal" ji xelkê Gundê "Kotana" - N.Bilbilê girtin, li dema lêvegera wan jê re û daxwaza wan jê malmewdanên çandinî û avekeriya yên ku dest daniye ser, piştî vegera hersiyan ji penaberiyê bo cî û warên xwe, û piştî sê rojan ew berdan, û daxwazên wan ji lêkolîn û dirêjpankirin û milmilaniyê re hîştin.

**-** Ji dora bîst rojan ve, Destlatên Dagîrker Hemwelatî "**Cîhad Elî Qadêr** /45/sal" ji xelkê Gundê "Kotana" - N.Bilbilê girt, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û ta niha li B. Efrînê bêsûcane bendkirî ye.

- Li 7.8.2023an. Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" Hemwelatî "**Ferhad Fa'êq Hemûş** /45/sal, **Mihemed Mihemed Tobal** /45/sal, **Mihemed Ehmed Seyid** /30/sal, **Hemîd Mistefa Xelîl** /30/sal, **Mistefa Mihemed Çolaq** /26/sal, **Cim'e Mihemed Kêlxelo** /28/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" girtin, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re -pirek jê carine berê hatibûn girtin- û bo Hepsa Maratê ya navendî birin; Û ta niha ew di bendkirina bêsûc de ne; Û herdu Hemwelatî "**Mihemed Mistefa Binefşê** /30/sal, **Cim'e Mustefa Ewan** /27/sal" jî ji heman bajarokê û (yên li 24.7.2023an. Z hatibûn girtin) li Hepsa Maratê di bendkirina bêsûcane de ne, bi heman tewanbariyê, û di rapora me ya borî de (254) bi şaştî berdana "**Cim'e Mistefa Ewan**" hat.

Weha jî Hemwelatî "**Mihemed Sibhî Çolaq** /65/sal" bavê "Mistefê" li 14.8.2023an. Z hate girtin, û piştî birina dabanca wî ya taybet jê û ferzkirina baceyeke diravî li ser, ew li 17.8.2023an. Z serbest hate berdan. Û "**Ferhad Fayêq Hemûş**" jî piştî ferzkirina baceyeke diravî /300/Dolar li ser, li 15.8.2023an. Z hate berdan.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li 6.8.2023an. Z, hêzên Milîseyên "Firqeya Nehan/El'firqe El'tasî'e" li derbasgeha Bajarê Efrînê ya Rojhilat - Kevan/El'qews/Riya Ezazê ketin seferbîriyê/amedebaşiyê, rê girtin û dest bi lêgerînkirina hemî makînan kirin -bi taybetî yên leşkerî- ji bo lêgerîna li endamin ji Milîseyên "Artêşa El'nuxbe" yen serkêşekî "Nehan" li Cerablusê kuştine.

**-** Li 11.8.2023an. Z, piştî ku xort "**Elî Mihemed Kênco** /17/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" - Navça Cindirêsê ji karê xwe yê li nav erdên çandiniyê vedigeriya, xortin ji anîndeyên "Humsê" rê lê girtin û hewil dan ku li dijê derkevin, û "Kenco" neçar bû ku berevaniya xwe bike, lê ew tûşî lêxistineke mekin û derbeyin kêran hat, û ji ber wê ji bo dermankirinê ew rakirin nexweşxaneyeke Efrînê, û li roja din bo mala wî hate vegerandin.

**-** Li 15.8.2023an. Z, Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Reco" kirin dû/dan dû kesekî li hundir bazara Bajaroka "Reco" û tewşankî qurşîn avêtin, ta ku girtin - lê me nikanî nasnama wî nasbikira, bê tu hesab ji sivîlan û derbasdaran re.

**-** Li 16.8.2023an. Z, dema ku Hemwelatî "Mihemed Sebrî Dawod" ji xelkê Gundê "Etmana" - Navça Reco li pêş mala xwe li Bajaroka Reco dest bi ajotina makîna xwe kir, da ku bavê xwe yê nexweş bighîne navenda şuştina gurçikan, giropeke gerok e hevbeş ji Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Reco" hewil da ku bigre, lê ew reviya, û wan hêzina qurşînên jîndar bervê û di ser re reşandin, û li nav bajêr dan dû bê hesab ji metirsiyên li ser jiyana sivîlan, û nikanî bigirta, lê me nikanî sedemên girtinê nas bikirana.

**-** Li Roja Înê piştî nîvro 18.8.2023an. Z, di pêvajoya komkirina "Firqit El'sultan Silêman Şah" ji nandozên xwe û malbatên wan ji bo hevgirtin û piştgiriyê bi serkêşê xwe "Mihemed El'casêm/Ebû Emşe" (yê ku Emrîka ceza kiriye) re, û hewlidana wê ku bandoriya xwe li Bajarê Cindirêsê fere bike, bi dehan ji wan li Kolana Nanpêjgeha "Medê" kom bûn, lê endamên milîseyên "Firqit Nûr El'dîn Zenkî" ji anîndeyên Bajaroka "Encarê" - Gundewarê Helebê yê Rojava rê li pêş wan girtin û qurşîn bi aliyê wan ve avêtin, û ji ber wê hin birîndar bûn, û hin din jî hatin girtin.

**-** Giropin ji jinên anîndeyên ku li çadirgehên/kampên "Dêrbelûtê" û "Etmê" rûniştine de, rojane êriş baxçeyên îsotên sor li Bajaroka "Celemê" - N. Cindirêsê û derdora wê dikin, û li pêş çavên xwediyan jê didizin bê ku wêribin li wan qedexe bikin, ji tirsa tuhmetên çêkirî û derew li dijî wan, û ferzkirina cezayin bêsûc û neheq li ser wan.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li 12.8.2023an. Z, kargêrekî ji anîndeyan li nêzîk goristana Gundê "Bircebdalo" - Şêrewa erdekî bi ferehiya dora /5/doniman da dûzkirin û hazhirkirin, bi armanca ku projeyeke geştiyariyê li ser ava bike, û divê bê zanîn ku ew erd "Sêf Ebû Bekir" - serkêşê Milîseyên "Firqit El'hemze" bi kirê dayê, û beşek jê malmewdanên giştî ye, û yê mayîn jî malmewdanên malbata Dilovanber "Hesen Osman" ji xelkê gund e.

**-** Ji çend heyvan ve, Xort "Zekeriye El'bustanî kurê Nesir" ji anîndeyan -bi zanebûna dê û bavê xwe- keça negîhayî "M.C.Eyn /17/sal" ji xelkê Gundê "Tilsilorê" - N. Cindirêsê revand, bi behaneya jinanînê/zewacê û çîrokek hezkirinê, û piştî kurtedemekê ew qewitand cem xwedana, ji ber wê bavê wê giliyek li ba Asayêşa Cindirêsê (ya ku xort û bavê wê girtiye) pêşkêş kir, û ew doz aniha li ba dadgeha dagîrkeriyê ciyê dîdariyê ye, û nûçeyin hene dibêjin destdirêjiyin jî li ser keçikê hene.

Hemî Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" û serkêşên wan di karanîna binpêkirin û tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê di Efrînê de mîna El'emşat û El'hemzat û El'şerqiyê ne, li gor bi hezaran raporên belgekirî û belavbûyî û bi sedan jî bînerdayînên qurbaniyan û merivên wan, ji ber wê tê xwestin bêne sezakirin û ne tenê ji Emrîka de, û weha li ser "**Hisên Hemadê** - Wezîrê Bergiriyê" û "**Ebid El'rehman Mistefa** - serokê Hikometa Demkî" ji ber ku -li gor ku aşkere li xwe dinin- ew yekser di ber "Artêşa Niştîmanî " de berpirsyarên cîbicîker in, û herweha li ser Serokê Hemahengiyê "**Salêm El'mislet**" û cîgirê wî "**Ebid El'hekîm Beşar**" ji ber nûnertiya wan a siyasî ji "Artêşa Niştîmanî" û lêsekirina saziyên wê re, û bi ser de jî berpirsyarên ku di demên berê de ji dagîrkirina Efrînê ketibûn ew ciyên berpirsiyartiyê.

Herweha Turkiyê jî tevahiya berpirsiyartiyê hildigre, çimkî ew dewleteke dagîrker e, giropên "Artêşa Niştîmanî" tîmar dike, mûçeyên wan dide, wan weke nandoz li hundir û derveyî Sûriyê bi kar tîne, û dikane rêgirekê ji binpêkirin û tewanên ku bi rengekî fere û lezgîn têne kirin re dîne, ji ber ku ew li ser serkêşên milîseyan û biryarên wan xwediyê desteseriyeke rastîn e, û herweha jî ew ji pêkanîna wan kiryaran re li dijî Kurdan şîretdarê bingehîn e, di çarçewa pêvajoya siyaseteke dijayetî ye li dijî wan rêbaz dike de.

20.08.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Giropeke wêneyên kombûna "Salêm El'mislet - Serokê Hemahengiyê" û cîgirê wî "Ebid El'hekîm Beşar", û Sertîp/El'emîd "Hisên Hemadê - Wezîrê Bergiriyê" û "Ebid El'rehman Mistefa - Serokê Hikometa Demkî", li gel

serkêşên milîseyan û berpirsiyarên saziyên "Artêşa Niştîmanî" û "Asayêşê", tîmarkirin û rêvebirina wan ji giropên çekdar re tekez dike, û dawiya dawîn berpirsiyartiya wan di ber kar û kiryarên wan de jî.

**-** "Ednan El'xuweylêd/Ebû Welîd El'ize - yê ji Bajarê Humsê" berpirsiyarê abortiya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" ê li Gundê "Qornê" - Navça Bilbilê rûniştî, dest daniye ser bi dehezaran darên zeytûnê û malmewalan, baceyên di navêna /10-50/% li ser werzên/mûsimên xelkê gundên ku di bin desteserkirina firqê de ferz dike.

**-** Piroseyên kolandinê û dûzkirina erdê li nêzîk goristana Gundê "Bircebdalo" - Şêrewa, yê ku "Seyf Bolad" - serkêşê "Firqit El'hemzat" bi kirê dayê.